# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (237) | Çileya Paşîn / 15-1-2023


# PDK-S: Her çareseriyek ji derveyî Neteweyên Yekgirtî êş û azarên gelê Sûriyê bidawî nake



**Kurdistan**

Di rojên 12 û 13ê vê mehê de, Komîteya Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S civiya, piştî civînê PDK-S daxuyaniyek belav kir û têde wiha ragihand, di civînê de bi awayekî sereke behsa amadekariyên lidarxistina kongreyê hate kirin û biryar hate standin di demeke nêzîk de were lidarxistin û hemû hewl werin dan ji bo serkeftina kongeryê, û Mihemed Ismaîl wek peyvdarê fermi yê PDK-S hate erkdarkirin heta lidarxistina kongreyê. Ji aliyê siyasî ve, civînê pêşhatên dawî li Sûriyê û deverê nirxand, herwiha giringiyeke zêde da rewşa xerab ya Sûriyê di gelek waran de. Komîteya Navendî ya PDK-S di civîna xwe de behsa nêzîkatiya vê dawiyê di navbera Tirkiyê û rejîma Sûriyê bi serperiştiya Rûsiya û bandora wê li ser opoîzsyona Sûriyê kir, û tekez kir"Dosya Sûriyê bûye dosyeke navdewletî, û çareseriya siyasî ya temam li gor biryara 2254 ji berjewendiya tevahiya aliyan û xelkê Sûriyê û penaberên vî welatî li Tirkiyê ye, û her çareseriyek ji derveyî Neteweyên Yekgirtî êş û azarên gelê Sûriyê bidawî nake, û çareseriya siyasî jî peyda nake ". Di civînê de, li ser zehmetiya xelkên Efrên, Serêkaniyê û Girêsipî hate rawestandin û ew fişarên li ser wan ji aliyê grûpên çekdar ve, û Komîteya Navendî tekezî li ser wê yekê kirk u pêwîste rê were xweşkirin ji bo vegera xelkê me ji malên xwe, û milkên wan ji bo wan werin vegrandin, û ewlekarî ji bo wan were dabîn kirin.

Di civînê de, rewşa xelkê Kurdistana Sûriyê di jêr rêveberiya PYD de hate behs kirin, ku ev partî fişarê li xelkê mayî dike bi taybet ciwanên Kurd bi mebesta koçberiyê û valakirina devera Kurdî ji xelkê wê, û girtina xebatkarên PDK-S, Endamê Komîteya Navendî Hisên Silêman, endamên Komîteya Herêmî û endamên Encûmena Niştîmaniya Kurdî Ednan Remo, Bilind Mela Ismaîl. Herwiha belavbûna diyardeya hejariyê û dizîna samanên çandiniyê petrolê. PDK-S behsa çawaniya pêşxistina karê Encûmena Niştîmaniya Kurdî, û başkirina xebata wê li ser asta Kurdistana Sûriyê, herwiha civînê hemû awayên guhertina demografî li Sûriyê û bi taybet li deverên Kurdî red kir. Li ser asta Kurdistanî, civînê bi giringî li Kongirê Partiya Demokrata Kurdistanê ku li Dihokê lidar ketibû temaşe kir, û xwestiye waneyan ji vî kongreyê werbigre ku bi serperiştiya Serok Mesûr Barzanî biser ket, û spasiya partiya bira kir li ser pêşwazîkirina serkirdayetiya PDK-S û pêşkêşkirina hêsankariyan ji bo serkeftina vê civînê li Hewlêrê.Herwiha civînê Yekbûna herdu partiyên Kurdî yên rojhilata Kurdistanê di jêr navê Partiya Demokrata Kurdistan-Îran bilind nirxand, û kiryarên rejîma Îranê derheqê gelên Îranê bi taybet binpêkirinên derheqê gelê Kurd yê ku ev serhildan bi xwîna Jîna Emînî pê xist şermezar kir.

# «Pêwîste PYD dest ji kiryarên kîndarî berde»



**Kurdistan**

Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S raporta xwe ya siyasî belav kir û tê de wiha derbarê rewşa Sûriyê û Kurdistana Sûriyê ragihand: Roj li pey rojê krîza Sûriyê aloztir dibe, û rewşa abûrî û ewlekarî jî têk diçe, li ser asta Sûriyê bi giştî û taybet deverên di jêr destê rejîma de, ligel belavbûna diyardeyên nerênî li nava civakê wek dizî û bazirganiya madeyên û zêdebûna tawanan, herwiha zêdebûna nirxê kelûpelan û madeyêns ereke yên jiyanê, herwiha sotemenî û madeyên xwegermkirinê.Ev hemû ligel zêdebûna rêjeya bêkariyê û daketina nirxê lîreya Sûrî beramber dolarê Amerîkî. Rewş niha li Sûriyê ji pîs bo pîstir diçe, û dengê nerazî roj bi roj bilind dibe, li parêzgeha Siwêda û Deraa, ev yek nîşana wê yekê ye civak bêza bûye, û hin pêşbîniya wê yekê dikin şoreşa birçiyan destpê bike, ev yek diyar dibe rewşa Sûriyê li pêşiya wêraniyeke abûrî ye, hin aliyên navdewletî dixwazin çareseriya siyasî li Sûriyê li gor biryara 2254 û lêvegera Cinêv1 be, û arasteya navdewletî di vê derbarê de bi awayekî demkî hatiye rawestandin. Astana û Soçî di navbera Rûsiya, Îran û Tirkiyê di vê dema niha de çalak e, Rûsiya dixwaze lihevhatinekê di navbera rejîmên Sûriyê û Tirkiyê de çê bike, heta ku Tirkiyê bîne aliyên xwe ji bo rûbirûbûna Emerîka û bidawîanîna rêveberiya PYD, herwiha dixwaze krîza Sûriyê bi dergehê Tirkiyê bidawî bike, yek bi lêdana opozîsyona Sûriyê ya Siyasî û leşkerî, û vegerandina xaka Sûriyê ji Tirkiyê ji bo jêr desthilata rejîmê, û heger ev yek bighê serî dê di berjewendiyên her yek ji Rûsiya û Tirkiyê û Sûriyê de bin, lê Îran rola wê li vî welatî kêm dibe.Rola Emerîka li rojhilatê Feratê û ragihandina wê ji bi çend caran ku ew ji Sûriyê venakişe, û dê rola xwe zêde bike, û avakirina çend bingehan û bi taybet li bajarê Reqayê , herwiha rijdbûna wê li ser Hêzên Sûriya Demokrat wek hêzekê ji bo parastina berjewendiyên wê û rûbirûbûna DAIŞê, tevî rola wê ji bo fişara liser Tikriyê wek hevalbendekî steratejîk û guhertina arasteya wê ji bo çareserkirina krîza Sûriyê.

***Tirkiyê di nava du bijardeyan de ye**

Tirkiyê, awayekî ji ibtîzaza siyasî bika tîne di navbera xizmeta berjewendî û ecindayên xwe ligel Rûsiya û Sûriyê, û parsatina pêwendiya xwe ya steratejî ligel Rojava, û bi taybet Emerîka ew jî ligel nêzîkbûna hilbijartinên vî welatî dixwaze xizmeta arasteya cemawerên xwe bike û sivikirina bargiraniya penaberên Sûriyê li ser Hikûmet û dewleta Tirkiyê, û dûrxistina metirsiya HSD jis er sînorên xwe, û pêkanîna awayekî baş ligel rejîma Sûriyê û heger li ser hesaba hevalbendên xwe ji opozîsyonê, di dema dawî de jî çend caran Tirkiyê gefa operasyoneke nû li nava xaka Sûriyê kir, lê dûdil e, ji aliyekî dixwaze Emerîka razî bike yan istixlala fakterê demê ku berya hilnijartinan e, tevî ku ew opozîsyonê han dide ji bo danûstandinan ligel rejîma Sûriyê.

***Rûsiya û Tirkiyê ji hebûna Îranê dilgiran in**

Îran, ji gelek aliyan ve bitirse, ji ber ku arasteyên piştguhkirina rola wê li Sûriyê zêde dibin, bombebarana Israîlê û gefa rûbirûbûna wê di ware leşkerî de, hevalbendên wê Rûsiya û Tirkiyê ji hebûna wê li Sûriyê dilgiran in, ev yek jî di demekê de ku fişarên navdewletî lis er wê di ware siyasî û abûrî de, herwiha ew tişta tê serê wê ji xwepêşandanên navxwe yên li nava Îranê.

***Kurdistana Sûriyê di rewşeke hestiyar de ye**

Kurdistana Sûriyê, di nav gelek pêşhatan re derbas dibe, û nakokiyên berdewam û gefên Tirkiyê yên berdewam bi êrîşkirina ser deverên nû li Sûriyê, ligel zehmetiya li deverên Kurdî û bi taybet Efrîn û Girêspî û Serêkaniyê ji hejarî û nexweşî û binpêkirinên berdewam ji aliyê grûpên çekdar ve, di vê seqaya hestiyar de pêwîste lihevhatinên nû werin kirin berev bihêzkirina pêwendiyan bi arasteya danûstandin û giftûgoyan berev hemahengiyê, lê hemû dibînin tişta ku PYD derbarê gelê me û encûmenê û partiyên siyasî û bi taybet Partiya Demokrata Kurdistan- Sûriya dike, herî dawî her yek Hisên Silêman Endamê Komîteya Navendî 28-12-2022 û Bilind Mela Endamê Komîteya Herêmî di 27-12-2022 revandin û berya wan di 12-12-2022 endamê Komîteya şaxê Ednan Remo revandin ûdi salên derbasbûyî gelk ji aliyê ve partiyê ve hatine revandin. Herwiha hejmareke kiryarên kîndarî li dijî encûmenê û partiyên wê û pêkhateyên siyasî û civakî , û kiryarên dijî xelkê me ji sepandina bacan û revandina ciwan û zarokan ji bi leşkeriya neçar, û belavkirina tirsê di nava xelkê de daku ew xelk koçber bibe berev tariyê ve, û ji ber vê yekê dibînin pêwîste PYD bilez hevalên me serbest berde, û dest ji kiryarên xwe yên kîndarî berde û vegere ser rêya rast ji bo xizmeta miletê me û daxwazên wî yên netewî û niştîmanî yên rewa.

# Guhertina demografî li Efrînê berdewam e


**Kurdistan**

Ji dema dagîrkirina Efrînê di Adara 2018an de, nêzîkî nîv milyon koçberên hawirde ên Ereb ji gelek parêzgehên Sûriyê lê hatine bicihkirin. Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan di raporteke de belav kir, di çarçoveya siyaseta sîstematîk a guhertina demografiya Efrînê de, hêzên Tirkî û komên alîgirên wê, gundên nimûneyî ji koçberên Sûrî li wê herêmê ava dikin. Diyar kir jî, ji dema dagîrkirina herêma Efrînê, nêzîkî nîv milyon koçberên ji parêzgehên Şama paytext û gundewarê wê, Humis, Hama, Idlibê, Reqa Dêra Zorê û heta hin malbatên ji parêzgeha Hesekê lê hatine bicihkirin. Da zanîn jî, bi dehhezaran koçber û di nav wan de hêzên çekdar û malbatên wan jî, di malên Kurdan de bi cih bûne, piştî ku bi darê zorê dest danîn ser mal û milkên wan. Rewangeha diyar kir, ewên ku di malan de nehatine bicihkirin de jî, gund û komeleyên niştecihbûnê yên nimûneyî li ser zeviyên xelkê Efrînê ji wan re tên avakirin. Herwiha got jî, artêşa Tirkiyê û komên girêdayî wê bi zanebûn li dijî gelê Efrînê pêvajoya bi navê guhertina demografîk dimeşînin ku roja Çarşemê 4ê Çileya 2023an, avakirina komelgeha niştecihbûnê ya bi navê "Ecnedîn Filistîn" a ku ji 50 xanî pêk tê li derdora bajarokê Cindirêsê bi dawî kirin. Ji aliyekî din ve rêxistina "Tîma Welat a Idlibê" 40 xanî ji projeyeke avakirina komelgeheke niştecihbûnê li ser endamên çekdarên "Ehrar El-Şam" ên alîgirên Tirkiyê belav kirin. Amaje bi wê jî kir, ew proje li ser rûbera 4 hîktaran ji zeviyên her du birayên ji gundê Şîtka Mecîd û Murad Menan hatiye avakirin ku ji 200 xaniyan pêk tê û tê de dibistan, mizgeft û navendeke lezberkirina Qur'ana Pîroz hene. Li gorî zanyariyên Rewangeha



Sûrî ya Mafên Mirovan, 18 komelgehên niştecihbûnê li bajarê Efrînê û derdora wê hatine belavkirin û ev komelgeh bi rêya rêxistina (AFAD) ya Tirkî û bi fonên Qeter û Kuweytê hatine avakirin: Li bajarê Efrînê: Di navbera gundên Marat û Kefrşîl de komelgeheke niştecihbûnê ya 100 xaniyan pêk tê, tê avakirin.Li navçeya Şêrawa: 2 komelgehên niştecihbûnê hene, ya yekem li nêzîkî gundê Basûfanê ye ku tê de 225 xanî hene, ya duyem jî li nêzîkî goristana Kurdên Êzidî li gundê Şadirê ye. Li navçeya Şera: 3 komelgehên niştecihbûnê hene, ya yekem li gundê Baflûnê yê Êzidiyan e û ji 100 xaniyan pêk tê ku di bin çavdêriya rasterast a Tirkiyê û fînansekirina Qeterê de hatiye avakirin. Ya duyemîn jî li nêzî gundê Berava ye û 125 xaniyan pêk tê. Ya sêyem jî li nêzî gundê Metîna ye, lê karên avakirinê niha hatine rawestandin. Li navçeya Bilbilê: 3 komelgehên niştecihbûnê hene, ya yekem li gundê Xilalka ye û ji 135 xaniyan pêk tê. Ya duyemîn jî li nêzî gundê Qestelê Xidiriya ye û 135 xanî jî tê de hene. Her wiha ya sêyem û ya herî mezin jî li gundê Qestelê Meqdad e û 250 xaniyan pêk. Li navçeya Rajo: 2 komelgehên niştecîbûnê hene, ya yekem li gundê Meydan Ekbes ye û ew 225 xaniyan pêk tê. Ya duyemîn jî li nêzî gundê Etmana ye û ji 100 xaniyan pêk tê. Li navçeya Cindirêsê: 4 komelgehên niştecihbûnê hene ku 2 ji wan li çiyayê Qêziqlî ne û bi navê gundê Besme ye û ji 247 xaniyan pêk tê. Ya sêyem li nêzîkî gundê Tetera ye û 100 xaniyan pêk tê. Ya çaremîn jî, li nêzîkî gundê Til Silûrê ye û ji 200 xaniyan pêk tê. Li navçeya Şiyê: 3 komelgehên niştecihbûnê hene ku yek ji wan li bakurê bajêr li ser rêya gundê Qermitliqê ye û ji 200 xaniyan pêk tê. 2 komelgehên din jî li gundê Qermitliqê û Deşta Sorikê ne, lê karên avakirinê li wan hatine rawestandin.

# Zarokeke din dibe qurbaniya kiryarên PYD



Rêxistina Mafê Mirovan ya Efrînê da zanîn, Tevgera Ciwanên Şoreşger ya bi ser PYDê ve keçek 16 salî ji bajarokê Til Rifetê yê bakurê revand. Rêxistinê di raporta xwe de eşkere kir, li Til Rifetê roja 7/1/2023an, dema ku keça bi navê Alîf Osman ya 16 salî diçû dibistanê, ji aliyê Tevgera Ciwanên Şoreşger hate revandin û bo navendeke leşkerî hate birin. Rêxistina Mafê Mirovan di raporta xwe de da zanîn, ji ber revandinê rewşa tendIrustiyê ya dayika Alîfê têk çûye. Li gorî zanyariyê Rêxistina mafên Mirovan, Elîf Osman sala 2007an ji dayik bûye, ji gundê Halîlê yê navçeya Raco ya Efrînê ye û ligel malbata ji dema êrîşa artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar li ser herêma Efrînê ve koçberî Til Rifetê bûye. Tevgera Ciwanên Şoreşger, rêxistineke ciwanan e û kar û çalakiyên xwe li herêmên Rêveberiya Xweser dike û car caran jî zarok û ciwanên di bin 18 saliyê re ji bo tevlîkirina bo karên çekdarî direvîne. Malbatên zarokên revandî jî kiryarên Tevgera Ciwanên Şoreşger şermezar dikin û bang li rêxistinên ku girîngiyê didin mafên zarokan, rêxistinên navdewletî û aliyên pêwendîdar dikin ku fişarê li Rêveberiya Xweser û HSDê bikin ta ku çarenivîsa zarokên wan diyar bikin.

# Nîşan û Rêşan (Sema çep)



Henan Cefer


Li baniya dirêj Nîşan pasevanê rez e, heroj diçe rez diparêzê. Rojekê Rêşan xwe bi xwe re dipeyvê bi xwedê min bîra Nîşan kirî ji zû de min nedîtî ye, xwe hilgirt û çû ba Nîşan demê digehê nav rêz Nîşan nabînê carekê gazî kir û carekê fêt kir, Nîşan bi hatina wî dilxweş bû û bi dengekî bilind got were were ez li virim hinda dara merxê, Rêşan hat haho tu li ser darê ye, erê hilkiş hilkiş… Rêşan hilkişî matmayî ma sewkiyek çêkirî ji werîs, şaxên darê û gibir, mînder û balîf jî ji mal hanîne û tembûr li ber sêrî ye, rûniştin li dem û rewşa hev pirsîn, li ber bayê hênik li serî sirtê li dihara çiya xem û şahiyên xwe bi benîkê jiyan ve dikirin, Nîşan dest avêt tembûrê û dest bi stranê kir peyv mina libên tizbiyê berdidan ser hev kêfxweş bûn, paşê bi hev re pevaxafîn kirin lêbelê di nav peyvan re Rêşan got bû çend dewain dengbêj dibêjê bazdana berçepkî anku bazdana berçepkî çî ye? Weleh ez jî nizanim ka em li dengbêj bigerin demildest ji dengbêj re lêdan û jê pirsîn lê mixabin got ez jî nizanim lê ji biçûkbûna min de û ji Kevin de wisa dibêjin, piştî telefûn girtin Nîşan dibê cureyek be ji semaya kurdî mîna awê hemo, çençeno û awê xatûnê, birayê Nîşan ji min re bû meraq gengaze binyata xwe hebê yan jî bi xwe çîrokek bê ji valabûn nehatî, pêşiyên me her tişt bikaranîne ger em pirskin emê hînî wata wê bibin… telefûnî mamostê xwe dîrok kir û jê pirsî, mamoste got ez nizanim lê carekê li civatê mamoste Wesfî çêrê dibû teqez agahî li ba wî ye, rasterast bi mamoste re dipeyvin û diçin ba wî û bazdana berçepkî jê dipirsin û dibêjin em dixwazin tu nasandina sema çep ji me re bêje. Erê demê em têkevin nava rûpelên dîrokê û kevneşopên bav û kalan, emê bi hev re herin hekarê êzdînşêr mîrê hekarê wê serdemê sefewiyan êrîşî hekarê dikirin û pêwindiya xwe bi Dumiliyan re hebûn lê nikarîn dagîr bikirana paşê di navbera sefewîyan û dumiliyan de peymanek çê bû ku bi serkeftin wê hekarê radestî dumiliyan kin bi du enîyan êrîşî hekarê kirin şikestîn hêza êzdînşêr hêztir bû, sefewî mina rovîyê xapînok ponijîn û bi dumiliyan re got hûn kurd li ba we roja çarşemê pîroz e de ka em di vê rojê de şer bisekinînin bi vê hizirê şandeyek şandin ba êzdînşêr û êzdînşêr pejirand, enîyê şer sist kir lê wan enîye şer ji hêla xwe de hêztir kirin û êrîşî hekarê kirin dagir kirin û mîr êzdînşêr kuştin û merivên xwe Koçber bûn. Dumiliyan hekar radest birin lê hekariyan jê heznekirin,

-piştî demekê vegerîn… Rêşan di vir de got mamoste em nehatin e ji bo şoreşa hekarê û ne jî çi bi heçi kirin e, mamoste berkenî bû û got hele aram be çîrok bi hev ve girêdayî ye vegerîn û bi hişê sefewiyan ponijin di roja çarşemê de êrîşî herdu kelehan kirin şûr û mertal di nav bare kayê de veşartin û peyan ka ji wan re birin û bi wê şêwayî rêzgar kirin, vêca li hev civiyan û govenda xwe çep gerandin piştî sûnd xwarin bi pirtûka reş û avêsta û ti car din rast nemeşînin ji bo mislimanan xopandin e. piştî demekê lêvegerînek ji vê sûndê re çê kirin dîtin cihû, mesîhî û misliman jî hene carek din li hev kom bûn ji nû de sûnd xwarin

-Xelekek mîna goka zemîn xêz kirin xençer di navînê de çikandin û desmala spî avêtin ser qevdê xençer û destê xwe kirin dest hev û bi sê pirtûkên pîroz sûnd xwarin wê govenda xwe çep bimeşînin, û ji wê rojê de govendê çep dimeşînin

-Spasiya mamoste kirin û bi dilxweşî vegerîn karê xwe, li hev temaşe kirin û bi hev re gotin û kenîn dest li destê hev xistin û wî got bêje, wî got tu bêje li dawiyê Rêşan got xwedêkê çi ji me kêm e em pirtûkên dîrokî, çand û evînî naxwînin, erê bi xwedê min kê jî mîna te bigota, xwandin taca zêrîn e.

# Bo keça Kurd



Me'sûm Bîco

Gotinek xweş bo mi rêkir
Vê keça Kurd û çeleng
Xweş silavek bo te rêkim
Ey hevala pak û şeng
Min dî xuşkê gul çînîbûn
Guh li helbestên dilan
Gul çi rengîn bişkivî bûn
Her li nêv şax û pelan
Were xuşkê bilezîne
Ey Gulîstanê bilez
Roj hilatî pir derenge
Tême dengê berx û pez
Bilbilê ser xweş firî bû
Va ji hêlîn hate der
Şir û helbestan dixwîne
Aviya gul hê li ser
Keskûsorek wa li jore
Mijûmoranek li bin
Ev hemû tev reng û dana
Ku ji Yezdanê mezin
Were bê his neke dengî
Hêdî hêdî deyne pê û gav
Hilmûbîn a xweş li gelyan
Weke enber û gulav
Ref qoligan yek li pêşe
Tev li dûv wî bûne hêz
Tevde rêzin wek nivîsî
Bo me şair xet û xêz
Wan ji zozên barkirîne
Çûne deşt û germiyan
Xweş tifaqek zor kirîne
Xwezî em jî weke wan
Demjimêrek bibihêre
Tu li çol û deşt û dare
Tu li çol û deşt û dar
Xelk û pala vane rabûn
Têne gelyan çûne kar
Ba û sur tê lêdixîne
Dihejin dar û devî
Lêdixin bibil gula zer
Nû li şaxan bişkivî
Wer bibîne deşt û gelyan
Va welat bajar û gund
Dehl û dar û çem û kanî
Van çiyayên pir bilind
Bide qîrek tû li Kurdan
Da bibin ew tev şiyar
Beje şair dil birîne
Roj hilatî wene kar
Yeke dîtir bêje wana
Tev silavan pir spas
Bêj welat nayên bi xekên
Ku Xwedayên xwe ne nas
barkirîne